Dumahîk *:H evpeyvîn...*

8- Hûn qedexekirina zimanê kurdî çawa dinirxînin, û rola zimanê me yê zikmakî di geşkirina xebata netewî ya nûjen û aştiyane de çawa dibînin?.

Bêgumane, qedexekirina zimanê kurdî û ne xwendina wî di dibistanan de, guneh û tewanekî mezine li gora lîsta mafê mirovan. Lê, ez dixwazim tiştekî bibêjim, ew jî ew e ku, em di serî de ez bi xurtî xwe rexne bikim, ji ber em weke dihate xwestin jê re ne xebitîn û em vê sersariya xwe nexin stuyê kesên ku çand , folklor û zimanê me li me qedexe kirine. Li vir, ez destên we digrim û bi dilgermî diguvêşim, daxwazê li we dikim ku hûn bi xurtî di vê rê de bixebitin, tevî ez baş dizanim bê çiqas rêl û kelem di riya we de hene.

9- Di dema îro de, partiya we çi karî di ber ziman û kultura kurdî de dike?.

Weke min got, ez xwe û partiya xwe jî ya ku ez pêşkêşiya wê dikim weke sekreter rexne dikim , ji ber ne guhdana pêwist ji zimanê kurdî re.

10- Eve 64 hejmar ji weşana Newrozê ya du mehane bi temenê 10 salan têne weşandin, hûn çi ji xwendevan û komîta wê re dibêjin, çi rexneyên we lê hene?.

Dûrî dilxweşkirinê, keyfa min gelekî ji vîn û israra we re tê ku hun weşana NEWROZ çap dikin û li kurdan belav dikin, ez jê re pêşketinê dixwazim, hêvîdar im ku xwestekên we bi cih werin da ku weşana Newroz bibe weşaneke aşkere û legal, bi serbestî keç û lawên gelê me wê bixwînin.

11- Ji bo guhdana xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî, hûn çi ji keç û lawên gelê me re dibêjin?.

Tiştê ez dixwazim ji keç û lawên gelê xwe re bibêjim, da ku ew hînî zimanê dayika xwe bibin, ezê gotina hevalê hêja, rêzanê mezin (NÛREDÎN ZAZA) ya ku sala 1956 an gotibû, dubare bikim:

(Gelî kurdan!.. Eger hun dixwazin xwe nas bikin û xwe bi xelkê bidin naskirin, ger hun dixwazin xizmeta gelê xwe bikin, zimanê xwe bixwînin û wî bidin xwendin...)

Li dawiyê, qedirnasî û hezkirina min ji we re birayên xoşewist di komîta NEWROZ ya ezîz de. Serbilind û bi rêz bijîn.

sipas mamoste, bimînî di xweşiyê de.

Qamişlo 15-02-2006 z

****

Şevek evînî

Di roja sêşemê 14\2\2006 an de , Komela Ciwanên Kurd li sûriyê, şahiyek bi boneya Cejna Evînê, bi beşdariya 45 ciwanan û mamosteyên hêja li dar xist. Û bi van çalakiyan şeva xwe derbaskirin :

1- Axaftin li ser pêwîstiya evînê di jiyana mirov de û bi taybetî di jiyana ciwanên kurd de û çawa ewê bi vê hestê re bidin û bistînin .

2- Mûzîkek kurdî xweş û rengîn .

3- Çend dirûşmên balkêş hebûn mîna **Zanîn , Ziman , Evîn bi wan civakê birengîn .**

- **Qamişlo , Kobanî , Efrîn di nav wan de biçîne evîn .**
- **Xwendin , pêşketin û evîn armancên me yên yekemîn e .**

4- Pêşbirk û diyarî ji ciwanên beşdar

Şandevanê N.W

Em - komîta Newrozê - Komela Ciwanên Kurd Li Sûriyê ji bo van çalakiyên hêja û binirx sipas dikin.